

Diwana Gulistan

<i>Gulistan</i>	1
-----------------------	---

Dilawerê Zengî

Gulistan

Helbest

2021

Gulistan 3

Mafên çapkirin û belavkirinê parastî ne

Helbestvan:

Dilawerê Zengî

Navê Dîwanê:

Gulistan

Tîprêz:

Şengo Dumilî

Berge:

Bavê Pêla

Çapa yekemîn Qamişlo 2019

Çapa duyemîn Qamişlo 2021

Çapxane: Pêla

Diyarî:

Ji bo neviyên min:

Lîlav,

Perî,

Honya,

Beyar

û Ava re pêşkêş dikim.

**Digel hêviya ku rojekê ji rojan çavên
min bi dîtina wan ronî bibin.**

Dilawerê Zengî

Qamişlo

9/7/2019

Pêşgotin

Rewşa gelê kurd ya jeopolîtîkî û dabeşbûna wan, kiriye ku rewşa helbest û toreya Kurdî bi giştî wekî rewşa ranyarî û civakî be.

Temenê toreya Kurdî, ne kêmtirî deh babilîskan e. Ji dema mîretiyân, ji babilîskên navîn, ta bi dawiya babilîska nozdehan ve, xwe dirêj dike. Ev dîroka dûr û dirêj, di çend qûnaxan re derbas dibe.

Gopîtkî yekemîn, di dema babilîska dehan de, bi serkêşiya helbestvan Baba Tahirê Hemedanî, xwediyê çarînan e. Ev helbestvan xwediyê pîtolî û zanyariya yekîtiya jîwerî (Kozmosî) ye. Bi raman û hizra yarî ya xwe, di Xweda û xweberiyê de dihingavt.

Gopîtkî diwemîn, di babilîska panzdehan de bi serkêşiya mele Ehmedê Cezîrî tê xuya kirin. Ev helbestvanê Kurd yê pêşî bû ku helbesta yarî (xezelî) ya Islamî derbasî toreya Kurdî kiriye û nuhtiye.

Gopîtkî siyemîn, di bebilîska hevdehan de, di çîroka navdar (Mem û Zîn)a Ehmedê Xanî de, diyar e. Tiştê balkêş, ko di wê demê de, li

Ewropayê, ji bo olî û dêrên Kasolîk û Pirotistanî hevdû dikuştin(1). Lê, li Kurdistanê dengê zengilê hişyarî û rizgariya gelê Kurd li ser destê Xanî xweş dihat.

Di babilîska nozdehan de gopîtka kilasîkiyeta nû di berhem û nivîsandinên helbestvan Nalî, Salim, û Mustefa beg de tê nuhtin.

Ev kilasîkiyeta nû ji bo rizgariya neteweyî jî dihat bikaranîn. Nemaze, di navîna dawîn ji babilîska nozdehan de, li ser destê helbestvanê mezin Hacî Qadirê Koyî.

Ta bi vê rojê, ev şêwe, di nav helbestvanên Kurdan de tê bikaranîn. Helbestvanin mezin di vê riyê de diyar bûn û navê wan di ezmanê helbesta Kurdî de geş bûn.

Ji şerê cîhanê yê yekemîn ve helbesta nûjen li nik Kurdan dest pê bûye. Li gorî baweriya min, ew jî di çend qûnaxan re derbas dibe:

Qûnaxa yekemîn, di navbera herdû şerên cîhanê de, bi serkêşiya Kamîran Bedirxan, Qedrî Can, Şêx Nûrî şêx Salih û Goran xuya dibe. Ev nuhtin û nûbûn li nik her helbestvanekî ji yê din cidahî heye. Ango li nik hin helbestvanan nuhtin

û nûbûn di warê ziman û şikandina benda kêş û bareyê de ye, li nik hinin din, nuhtin û nûbûn di naverok, raman û hûnandinê de ye. Herweha li nik hinin din nuhtin û nûbûn di ziman, naverok, raman û kêşesaziyê de ye. Hêjayî gotinê ye, ko berî herkesî yê helbesta nûjen nivîsandiye Dr. Kamîran Bedir-Xan e* .

Qûnaxa diwemîn piştî serhildana tevgera Ruwange bi serkêşiya helbestvanê mezin Şêrko Bêkes e.

Manîfestoya Ruwange, ji bo tazekirina helbesta Kurdî hawarek bi serê xwe bû. Mirov dikare bibêje ku ev manîfesto digel nûkirin û azadiya helbestê, nûkirin di ziman, raman, çîrok û nêrînin nû di civatê jî de bû.

Piştî vê tevgerê, qûnaxeke nû, li ser destê çend rewşenbîrên Kurd mîna; (Ferîd Zamdar, Enwer Misyefî, Kerîm Deştî, Dilşad Ebdile, Ferhad Şakilî û Letîf Hilmot.....htd) xuya bû. Evan rewşenbîran bi nuhbûn û nûxwaziyê bang kirin.

Di nav Kurdên Sûriyê de dest bi nivîsandina helbesta nû bûye. Kelandinek li ser pêmayên

* Li kovara (Hawar)ê vegere.

mîrê ronakbîran Celadet Bedir-Xan, Dr.Kamîran Bedir-Xan, Qedrî Can, Cegerxwîn, E. Namî, Osman Sebrî, Ehmedê şêx Salih û Tîrêj heye.Hin xortên nûhatî bi şêweyên nûkirî, dixwazin dest bi hûnandina helbesta kurdî ya nû bikin. Di hin helbestan de çirîska hêviyê dibînim.Lê, neyê hevotin ku helbesta nûjen cihê xwe li nav me girtiye û bûye mîna helbesta kilasîk, xwedî dibistaneke serbixwe. Ûşt û sedemên vê yekê pir in. Derd û kulên me jî gelek in. Ev cih ne cihê serseknandina vê yekê ye.Tenê tiştê balkêş ev e: Reh û çavkaniyên helbestvaniya van kesan, yan jî çavkanîya helbestvanên Ereb, an jî helbestvanên biyanî yê ko helbesta nûjen nivîsandine, werdigrin û riya wan dişopînin. Mexabin, di bin bandûra peyrewî û hevenda vê diyardekê de, û li ser vê riyê mane. Hin jî hene bi zimanê biyanî (Erebî, Tirkî, û Farisî...td), diramin û bi kurdî dinvisînin. Helbestên wan bê sûde, bê fesal, bê serûber, xav, kerik û bê hawe ne. Giyanekî bê can, balayeke bê per û bask û sirûdeke bê awaz in.

Rast e, mirov nikare şîretan li helbestvanan bike. Lê mirov wek xwêner dikare nerîna xwe di helbestê de bide. Xwendina helbestê ji mirovekî

ta bi mirovekî din ne tenê cuda û tê guhertin. Lê belê, xwediyê (afirandekê) helbestê bi xwe, piştî çend xwendinan, tiştin nû jê re xuya dibin. Ev jî ji ber ko (hest) di sînora gotin û şorzaran de nayê bestîn, û ne jî tê hevragirtin. Ji ber ku ziman nikare (hest) di bûyîna wî ya xweberî de jiber bike. Divê têkiliyeke giyanî di navbera xwendevan û helbestê (pîrsur û pîrsurî) de hebe.

Helbest, ne diyardeke sekinî û bê liv e. Ne jî dîtaniyeke eka dîmî ye. Liv û guhêzeke hundirî di cîhana peyv û şorzaran de digere, û jiyanêke sermedî ye. Roleke mezin di pêşketin û nûkirina raman, hizir, ziman, huner û civakê de dilîze.

Helbest deryake ji evîna bê dorpêç û sînûr e. Bê rawestandî û miçiqandin, dizê û diherike.

Torevanê Ferensî Vigtor Hocer Dibêjr: Her tiştê di jiyanê de ew jî bo çêkirina helbestê ye.

Hinrî Lafdan dibêje:

Helbest ew giyanê gel e.

Zanyar Eristo dibêje:

Helbest dimîne helbest heta ko bê terazûwê be jî.

Torevanekî Ispanî dibêje:

Helbesta ji helbestvanekî têgihîştî mîna hungivê
ji gul û rîhana ye. Çewa hunguv ji bîna gulan tê
der, weharengê helbestên durist ji ramanên
helbestvanên xwedî hestxweş tê der.

Nivîskarê Rûsî Xoxol dibêje:

Helbest perî ye hatiye serdana cîhana me dike.
Heger ew perî koçke wê çî bi serê vê cîhana me
were!.

Şikispîr dibêje:

Bahewa xweş be, bayekî hênik rabûbe,
helbestvan li nav erd û ezman binêre wê gul
mina steyrikê bibîne û steyrik mîna gulan bibîne,
û ji ne tiştêkî tiştêk çêbike û wê ji nik xwe reg û
gewdeyan bide wan tiştan û navan jî li wan bike.

Sedr El'Ezem)fûad Paşa dibêje:

Huner û helbest du hunerên ji ezmanan di riya
xweberî û jinan re digihên me.

Dilawerê Zengî

Herbst.....

Gulistan 13

Min Şop Ajot...

Li welatê rojê,...
Li delava Derya Sipî,
Li welatekî kuştî,
Li çiyayê gurandî,
Li deşt û nehêlên darvekirî,
Li ser hilma xwîna kizirî,
Min şopa xewna xwe ajot...

Li rojhilat, heyva çarde me..
Rêvingên riya birîndar,..
Ez û pênivîs û qetek nan.
Di dilê şevê de,
Di cegera asîman de,
Di rêkên herifandî de,
Bi gavên xweyî razayî,

Li ber dîwarekî bê guh,
Min pênivîsa xwe şiyar kir.

Kerwanek ji stêran,
Neynika xewnên min şikandin.
Çûkên ramanên min firandin.
Di çavê şeva kor de,
Bi xewnên pêçayî,
Dilbijandina pênivîsê,
Talankirim..
Wêrankirim..
Lê, min şop ajot...

Ez û pênivîsa xwe,
Bi refên kul û derdan,
Bi xiştexiştê pênivîsê û
kirtekirta nanê tisî,

Bi gavên birîndar,
Bi zimanekî bê giyan,
Ji salên bê demsal,
Darbesta demên beravêtî,
Li milên miriyan bar kirin..û
Min şop ajot...

Şev û roj li me bûn hêlan..
Di quncikên kit kita çerxê,
Movikên demê digurînin..
Li deşta Mêrdînê,
Li ber dêmên gula berberoj,
Pencên rojê yên qemirî,
Li ber sîka bê ken,
Agirê sar û westiyayî,
Çemên dîl û giriftar,
Li deşta leylan û awêze,

Bi pêlava xewnên pênivîsa xwe,
Min şop ajot...

Homanên xêrnexwaz,
Di qoqê kewênêr de,
Hêlînek belav kirin.
Di gerîneka çavan de,
Şopa xwînê gerandin.
Li ber seqema hewesa min,
fenera dilê xwe vêxistin.
Li ber pencera demên min,
Bêndera demên xwe gêrandin.
Li ser baskên xewnên min,
Hêviyên xwe veçirandin.
Li ber deşta ramanên min,
Dehl û zeviyên xwe şînkirin.
Li ber germbûna devê birînên min,

Termên hêsrên xwe ziwa kirin.
Li ber saza ahînên xwîna min,
Peyala meyê gerandin.
Û li ber çingîna peyalan,
Min şop ajot...

Di gerînoka mişextiyê,
Di şevînên qetiyayî,
Di awêza awareyî,
Li çiyayê gerdenazad,
Ji girêbend û lalên zinger bûyî,
Kewênêr bi azatî azad bûn... .
Bi qebqebeke nû,..
Bi dilekî aza,..
Bilûra xwe saz kirin,..
Û bixwe re,..
Mizgîniya maçîkirina heyvê anîn..

Kurmê Darê ji Darê ye

Ey bira tu binêre,

Şax û gulyên li darê

Serî hildan ber bi jor,

Bişkoj vebûn ji xarê

Li ber roja zêr reşan,

Pelzêr l'eniya yarê

Bisk û kezî tev berdan,

Zilfên li ser guharê

Li ber bayê sibayê,

Sema tê gulyên darê

Por li deşt û geliyan,

Çînçîna zilfên yarê

Hibrî bi ser xwe wer kir,

Ji kulîlkên hinarê

Bejin kada mirovan,

Wêne ji geh nîgarê
Dest û mil ezman hildan,
Hevpêçana serbarê
Çi zirav û çi sitûr,
Tev ji qurmê vê darê
Rehê lingê xwe berdan,
Di nêv xaka nêdarê
Li jor ezmanekî xav,
Ne baran û şehdarê
Pertewa tav û birûsk,
Da gelî û zinarê
Bager û toz û dûman,
Ji jor bi ser tê xwarê
Ziyakî marî çar ser,
Talan bi alîn yarê
Zor û zeber li şaxan,
Zingar bû qurmê darê

Gelek ramûsan wê dan,
 Ji lêvên sor sûxarê
Kuştin, mirin, armanc e,
 Ji destên siyehkarê
Pir weşîn pelê jînê,
 Ji perçebûn ji parê
Kurmê darê ne jê be,
 Zingar nabe kevnarê
Şan û rûmet nema hew,
 Ne şîqîna hawarê
Ew kirasê li bejnê,
 Her kes lixwe diparê
Girtî û berê te me,
 Sêv ne, j dara hinarê
Zimanê lal bê gerîn,
 Çavê kwîr vebî xarê
Reh tu bighîne derya,

Jê vexwî xwîn li karê
Kurmê gerdin bê kuştin,
Dûv e, şûr du rû zarê
Baran bi peşk bibarî,
Şebnem li dêm bên xwarê
Tişt xweş e, di çaxê xwe,
Zer bibî berê darê
Şax û terhên te geş bên,
L' Mehabad û Qentarê
Agirî, Zozik û Zaxo,
Li Mûsil û Enberê
Li Cizîr û Efrînê,
Dêrsim û Şanbêcarê
Ava gola bela be,
Şîn bên terhên mişarê
Tovên zanînê nû kad,
Nifşên nû hoşiyarê

Riya jînê da biçin,

Berokaş û dijwarê

Ger serxwebûn bidîta,

Dê nema setembarê

Bi yekîtî û zanîn,

Liberxwedane yarê.

Pêdar

Pêdar im ez pêdar im

Tev pêt û tev bi ar im

Roja tême meydanê

Birûskan tînim xwarê

Ev agirê serxwebûn

J' azadiyê re hebûn

Li serê koh û çîyan

Rohnê didim zinarê

Agirekî bi reh e

Berê wî pir fireh e

Va bûye bîst û çar sal

Dikim qîr û hawarê

Êşa wî pir giran e

Şewata wî derman e

Agir vêxim bi agir

Neyar ez bînim xwarê

Her setem û zînat bê

Tim kuştin û şewat bê

Liberxwedan pêdar im

Cangorî me ez yarê.

Li Qamişlo

Kurê'm Ronî Xwedê zane

Li Qamişlo bû talan e

Ne xewar be dilo rabe

Xewa şêrîn hilo rabe

Çi qêrîn û çi hawar e

Çi fîxan û zarezar e

Binêre law birîndaran

Li kuştî û li kuldaran

Li ezmana pêt û rivîn

Li kolanan laşên birîn

Li Cizîrê bû talan e
Hewara dê û bavan e

Şewat û agir û bîn e
Ji barûdê hilma xwîn e

Wer ji kurdan dil bi kîn in
Wekî gurê dev bi xwîn in

Tiyê xwînê birçiyê laş
Ji zikreşî bûn gornepaş

Li me êl û eşîr bûn yek
Digel leşker tev lek bi lek

Dilê dijmin b,kerb û kîn e
Ji mêj de ew har û dîn e

Ne jînyar in ne mirov in
Ne pişt û dost hirç û hov in

Di zindana kûr û tarî
Dikin feryad ji bêzarî

Ji me tijî kirin zindan
Timî girtin timî lêdan

Hewar dikin gazî nayê
Giriftarin weylê dayê

Li van xort û pîr û kalan
Li zarok û li mendalan

Li her cih talan û kuştin
Li me ceger tev biriştin

Belê gunhê me em Kurd in
Bila em tev can bi ser din

Bi xurtî û bi mêranî
Bi zanîn û bi rêzanî

Hewar Kurdo ji rêzana
Ji civînên bê zimana

Li bê xwedî û xizana
Keda bêber ya nezana

Me çi xwest û we çi anî
Ketin davê bi erzanî

Çima bawer bi wan anîn
Ne xwedî soz, gotin kanîn

Kurê m Ronî bike gazî
Li kurdên mêr serfirazî

Xwedî rûmet desthilînin
Ji nezana rê bistînin

Li me roja raperîn e
Belê law tu serhilîne

Ji vê dozê rê bernadin
Ku gerden ew li me badin

Hevalê wan pakrewana
Di vê rê de tu wek wana

Li meydanê bi nîşanî
Eger bimrî pakrewan î

Silavên min bighîn wana

Li canê wan şoreşvana

Hezar mehder li giyana

Buhişt û bax cihê wana

Bêjin Erê.. Barzanî Rêberî

Aferîn aferîn, serwer û rêberî
Şahsiwarê netew, serxwebûn perwerî
Her hebî her hebî, Barzanî rêberî

Deng bidin, reng bidin, zer veda Mîdiya
Hilgirin, ber bi jor, al û text ser piya
Pêşemerg canfida, dewleta Kurd jiya

Dewleta Kurd vejî, keşwerî û bi al
Ew bihişta zemîn, kaniya zêr û mal
Kurd bizan, tolhilîn, em hemî xort û kal.

Ber bi banga sibê, şev ku çû roj hilat
Xew hilavête hew, zanebûn pêkvehat
Serbilind her bijî, koletî va hilat
Qamişlo

21-6-2017

Şîna Xebatkar Hemîd Hec Derwêş

Gelî Kurdan! Bi nazdarî temaşakin li gorê
Xetîra rok, bi pîrozî, xwe pêçayî, li dorê
Ji rengan kesk e, sor û zer, sipî mora ji rokê
Bi rêbaza, bihevkeşî, te hûnandî ji kokê
Heval û dost, bi coş hatin, ji sûnda wa bi dozê
Li ser rêça xebat û kar, bi peyman û bi sozê
Bi embazî çî dirdan û perû nîşan li sêngê
Buhadarî, bi dilsozî, serengînî, ji hêngê
Bi serberzî vejandî Pêşverû Partî li her der
Riya tarî te ronî kir, bi ramana xwe serder
Tu dabînî xwedî înan, li mafê Kurd nigezdar
Bi damana, li ser doza rihabûnê emîdar
Gelawêj bû çirîska geş, li ezmanê me Kurda
Şeva tarî bi hingûrê te hêvîsa bi sur da
Ne bêpal bû, ji sewdan û ji penda şehreza bû

Temîzsinç û bi serpak û mefa û mîreza bû
Bi hêvî û bi lav im ez, ji Homan û Xwedayê
Buhîşt û bax, dilovanî, li gora wî bidayê
Li Qermanê, bi şanzî serî danî mefadar
Di nav dost û hevalan her mirovhez û wefadar.

Qamişlo 21/10/2020

Ez Evîndarê Welat im

Ez evîndarê welat im, serbilind û payedar
Qehreman û serfiraz û canfidayê xwîn li kar
Serwerê pa leşkerê min, can bi gorî pakrewan
Agirê cenga welat im, pêt û arê kûrexan
Her wekî şêr û pilingan, pasevanê cih û war
Va ji xew rabûme îro, dê hilînim tol û bar
Dane pey hev, ger çi jin bin, ger çi mêt bin naşikin
Wan bi xwîna pir temîzî, dengvedan pir ragirin
Hîn bi merdî xwîn dirêjim, min divê her serxwebûn
Dê te rizgar kim ji dijmin, ta hebê ev can û xûn
Vaye dijmin ew bi zorê gir û kîn û sextekar
Dest bi şûrê olperestê Daişê pîs û gemar
Ey xinizkar, mafnenas û gîhekêşê bedperest
Serbirîn in, ew ji tuxmê wî Hecacê olperest
Cengiran û berxwedan û şer li Kobanê gelek
Xwîn dirêjin her li Karin keç û xort tev lek bi lek.

Ferînaz Bûka Kurdistanê

Serî rakin, li banî tev temaşakin perînaz î
Li ezmanê Mehabadê firî bala, bi çengbaz î
Perî û bask, li jêr û jor, dikî perwaz keça kurd î
Xetîra roj seranser girt şeva tarî hila find î
Li Kurdistan te ronî kir, çirîska rojhilata min
Nema xew tê, hilavêtim, şiyar bûm ez xelata min
Vejinim agirê Kawa, li hevrêzên çiyayê tû
Ku pêxember Zeradeştê Evesta girt ji tayê tû
Li ser ola te candar in, bi halana kurên Qazî
Bi rêbaza rewanpakan, bi hawara Ferînazî
Xudanrûmet, keça bavî, bi sincî pa û şêrnêr î
Ji destên wan kurên dêlik, gihakêş in, ne serjêr î
Perînazê, li Kurdistan, bi xemla zer ciwanbûk î
Bi alaya zerê Mîtan, bejinbalan ji nû nû kî
Cil û berên hevirmêşî serî taca Şerefxan î

Buhişta sermedî îrem, ji nîgara te lê danî
Qeşenga min xudanaz î, tu dotmîra gulîzar î
Di dil min da, rehê şaxan hezar gul dan, tu jîndar î
Mirin jîn da kesên paqij, riya rûmet, bi comerd î
Ferînazê, li Qamişlo, bi rojbûna xwe pamend î.

Kobana Berxwedêr!

Li Kobanê birîndar im

Dikim gazî bi hawar im

Li kurdên mêr xwedî rûmet

Hilînin tol li bin bar im

Ji kobanê ji vî şarî

Penaber bûm ji bêçarî

Nema min kes ne ap û met

Ne dê û bav ne dostyarî

Ji ber Da'iş divê yek bin

Xwedî rûmet bi hêz çek bin

Li hember wan neyarên çet

Wekî arê bi dan şek bin

Welatê min cihê mêran

Cihê gernas û tev şêran

Nema bêpişt nema binxet

Bi hêza van ciwanmêran

Efrînê

Efrînê xweş Efrînê
Navê te pir şîrînê
Lîlavê him avjînê
Çîmen û deşt û şînê

Efrînê bû talan e
Xwînmijê Erdoxan e
Keç û xortan halan e
Roj roja berxwedan e

Efrîna me şîrîn e
Dijmin ew har û dîn e
Karê wan serbirîn e
Kuştin û şer û kîn e

Efrînê serhildan e
Kobanê navnîşan e
Cizîrê navgiran e
Ev xemla Kurdistan e.

Gazîne ji Kê Bikim?!

Gazîn nema xwedî şûnkar

Êdî ji we bikin yek car

Dilmayîn ne ji bo neyar

Ev daxwaza karê we ye?!

Karê we ma di sersala

Yekîtî dan dest peyala

Vexwarina xwîna pala

Ev giştin û karê we ye?!

Li ser masan dighêjin hev

Noşîna mey qurpîn e tev

Paşgotin û berberî ev

Pêşketina karê we ye?!

Bi gotinên we'y ser pela
Rizgar bûn gel wekî gela
Rengê we tev sor e, bela
Çi perçe û parê we ye?!

Roj bi rojê perçebûn e
Kêsbazî û serxweçûn e
Ji bo gel ne pêşveçûn e
Pergîriyê karê we ye

Yekîtiya ji bo welat
Ev doz ji we tevan dihat
Ji bo xebat nabin civat
Ev kar ne ji karê we ye!

Ka we çi kir çi bi ser dan?!
Heta kengî bi van xapan

Rik û pefçûn, dij û dilman

Bawerî neyarê we ye

Doza welat kavi kirin

Êdî ne bes parvil kirin

Ne bawerî ne dilkirin

Êlî pesinkarê we ye

Eman ji ber destê keftar

Gur û rovî û segên har

Gornepaş û deh rengê mar

Teqez ev 'iyarê we ye

Îro millet j' xew şiyar e

çav li rê û bendewar e

Li dengê min xweş guhdar e

Gel qet ne hevkarê we ye

Bi rastiye bikin xebat

Yekiti bi heza civat

Dest bidin hev roja me hat

Kurdistan ew ware me ye.

Ne Dîn im Ez Dîdar im

Bê pirs ji min Yezdan te kir

Anîna'm ser riwê gerdûn

Bi min nerîn, nezan kê kir

Ne bi peyda, mafê hebûn

Veşirî te vêraste ser

Rêça narvîn têye rehber

Nezan û jar, xizan bêber

Ji te çiyê rengê rencûn

Hebûna te sermedî ba'm

Tu bêr û şer, ji min çi kam

Kut kim di pêş navê te lam

Digel min tê nû xuya bûn

Çi karim kar, girêdim pişt

Ehrîman bû, bêpar te hişt

Ewî çêkir dogeh, buhişt

Min jî navê, kolîtî bûn

Têne çandin, tovê jînê

Payiz lê tê, dû havînê

Hin hişk dibin, hin tên şînê

Her ev e, ev jîna hebûn

Zirav im ez pir di vê rê

Bargiran im ji nifşê bê

Rastî min got bo kurê dê

Ne dînî ev dîdarebûn.

Sirûda Abeya Kurdî

Bijî bijî Kurdistan
Me rê girtî biçûkan
Emê herin dibistan
Ji bo hînbûna ziman

Zimanekî şêrîn e
Civan û hungivîn e
Elîfbeyê bixwîn e
Sîh û yek tîp bi cî ne

Ji tîpan heşt şiyar in
Bîst û sisê xewar in
Navê wana dengdar in
Bê dengdêr ne li kar in

Dengdêr, pênc jê stûr in
Tîp in girs û dengdûr in
Sisyê mayî pir kûr in
Him kurt in him jî hûr in

Dibistana tekoşer
Hînbûne wane ji ber
Kar û xwendin, zanewer
Mamostê me Dilawer.

Gelawêja Biçûkan

Gelawêj û gelawêj
Ji zarokan re tim bêj

Bi fêrbûn û bi vînê
Dibî navdarê jînê

Ji zanîne tu bû doz
Ji zarokan re pîroz

Ziman şêrîn û nûjan
Gelawêja biçûkan.

Ey Mirin

Diyarî ji bo giyanê pêşewayê gelê Kurd nemir
Bavê Şiyar re pêşkêş dikim û bejna xwe li ber
gora wî ya pîroz ditewînim.

Ey mirin,
Ey mirina reş,
Ey mirina bê bext û ol,
Ey narevîna xiniz û sergerîn,
Ey feleka bê zik û pişt,
Bi pencên xwe yî rewrewkî,
Bi bejna xwe yî xapînok,
Te konê reş li ezmanê me vegirt,
Heyv ji ezmana hilweşand,
Stêr û gelawêj te herifand..
Siyasetvan û rêberan rê winda kirin,
Rewşenbîr û zana nivîsên xwe çirandin
Ronakbîran pênûsên xwe şikandin

Bûk û zeriyan rondikên xwe barandin
Dê û bavan şîn gerandin
Zemîn hejî, perî govend gerandin
Li me hejaran serî gerandin
Şev reş û tarî, pişt li me şikandin
Ka rêberê me, ka ew qehreman
Zû ji nav me barkir gihaye kerwan
Kerwanê nemiran wa ye li rê ye
Hevalê Ismaîl rêberê rê ye,
Digel Zaza, Hemze û Osman,
Civînê deyne rêberê Kurdan,
bangê bide Tîrêj û Cegerxwîn,
Keleş û Bêbuhar, seydayê Namî,
Gel tev şiyar e, lê dil birîn in,
Ji çûna we tevan ew dilbixwîn in,
Heyfa li wê heyfê ko hîn bibîn in,
Şûna şêran kund lê dixwîn in.
Ey mirin
Rast e, te ew ji nav me bir,

Ji ber çavan te, ew winda kir,
Lê, bi sûnd, bi soz û peyman
Bi kêla ber serê pakrewanên Qamişlo
Bi gora pakrewanên sînema Amûdê
Bi Laleşa Nûranî..
Bi gora vî pakrewanî
Tê nikaribî bîr û baweriyên wî
Raman û ramyariya wî
Ji hişê me derîne
Tê nikaribî hezkirina wî
Ji dil û canê me derxîne
Ey mirina bê bext û ol..

Bavê Şiyar Namirî

Kî serok û rêber e?
Bavê Şiyar serwer e,
Taca zêrîn li ser e,
Kes nîne li hember e,

Tev de bêjin: Namirî,
Pêşewa û serwerî,
Him serok û rêberî,
Namirî tu namirî,

Qehreman û rêzanî
Perwer û torevanî
Rêça xebatê danî
Wek serokê Barzanî

Kêr nekir zilm û zorê
Serbilind çûye gorê
Ala wî tim li jorê
Xort û keç tev li dorê

Bavê Şiyar zindî ye
Navê wî sermedî ye
Şûna wî tim li cî ye
Partiya Yekîtî ye

Kî bibêje: Newa ye
Peyva dijmin li ba ye
Zikreşiyê rê da ye
Nokerî lê rewa ye.

19/10/2010 Qereqoy/ Dirbêsiyê.

Ji Rewan re

Ez vê helbestê diyarî keça xwe ya delal û hêja
Rewan Zengî dikim..

Rewan keçek nûhatî

Xwedê daye l, hevhatî

Çi heyv e, nûhilatî

Ji bavo re xelatî

Bi hatina Rewanê

Xweşî kete cîhanê

D, bîst û çarê gulanê

Vekir çav li jiyane

Li dinê bû ronahî

Buhar û tev şînahî

Li dilan kêf û xweşî

Ji çavan re bînahî

Keçek naz û çeleng î
Çi kubar û qeşeng î
Bi ziman û dilşeng î
Di zanînê ferheng î

Çiqas bêjim ciwan î
Sitêra li ezman î
Tu serwera keçanî
Wer rêber û rêzan î

Delalê xwendevanê
Bi zanîn û viyanê
Berî bid dibistanê
Hevalê bargiranê

Bi xwendin û zanînê
Dibî xwedana jînê

Bi pirsîn û mizgînê
Wer dermanke birînê

Evîndara welatî
Tu hêviya xebatî
Bi rojê re hilatî
Çi mizgîn û xelat î

Ji Xwedê re sed şabaş
Ewî da min keçek baş
Bi hêviya rojên paş
Di pesnê de nebim şaş.

Hêvîn

Hêvîn e hingûr û elend

Zêrîn e gerdenzêr e çend

Şêrîn ziman û zar e qend

Hêvîn tu dotmama min î

Bejna bilind dara çinar

Por ser mila gulî li xwar

Çavên xezala kil li kar

Hêvîn tu dotmama min î

Para Xwedê Hêvîn tu wî

Jîr û qeşeng û vîn tu wî

Nêrgiz li baxê jîn tu wî

Hêvîn tu dotmama min î

Taca te taca kişwerî

Dotmîr û xan û serwerî

Malbat ji qenc û perwerî

Hêvîn tu dotmama min î.

5-1-2016 Qamişlo

Palûte

Palûte palûte ye

Genmê zer û gewre ye

Ev xak û zadê me ye

Ha wer ne vê palûtê

Palê xwe bicivînin

Dasa di dest hilînin

Zadê xwe tev biçînin

Ha wer ne vê palûtê

Xebata gundiya ye

Keda xûşk û bira ye

Çinîn bi me teva ye

Ha wer ne vê palûtê

Çinîna genmê zer e

Pala xwe dane ber e

Gundîno îro şer e

Ha wer ne vê palûtê.

Bes e Yarê!

Te cana can, li baxê dil dibit canê bibînîm ez
Şeva tarî, li ber çavan ne sawêr bî hilînîm ez
Temaşakim te nabînîm, bi derdê dil birîn im ez
Bi ah û ox, bi fîxan im wekî bilbil dixwînîm ez
Birîndarê, bi hêvîya ji rewş û dîtina cana
Disotî dil, ji axîn û ji nalîn û ji kovana
Ji pêta ar birînkûr û xewa min bir, hemî jana
Nehatî ser nesaxê nav livîn û êş, bi dermana
Ne min hêz ma ne ling û çog ne per û bask, li rû yara
Ne pêjn û deng ne hilm û ba ne hilbûna, ji cihwara
Ne zar û peyv ne ronîya, ji çava ma, li xembara
Girî û kel, bi fermiskan, bi coş tèn der, li şûn yara
Ne axiftî dilopek xwîn, ji derba wê kevan û tîr
Ji laşê bê rewa û can, çî wê derbî, ji çerm û çîr
Ne bes yarê te ez kuştîm, gelek wek min ciwan û pîr
Di vê rêka Memê Alan rewanpak im, ji derba şîr.

Yarê

Yarê bi min xweş kir bihar
Ew dilbera ber vî dilî
Çîncîn li zilfên tar û mar
Ew nazika dest û tilî
Burhên li takî têne kar
Çavên direş kanya kilî
Lêvên di sor wek xunçe xar
Bejna zirav por ser milî
Sînga bi ber sêv û hinar
Da min bi şermîn û gilî
Min da ye ber maça bi car
Yara bedew bê deng bilî
Vîna bi şêt dîn û çî har
Êşa te dan ser vî kulî
Nakim ji bîr xalê nigar
Xala li dêmên sorgulî
Rewşen ji rû ew hate xwar
Deşt û nehêl nîva gelî
Tavê ji nû da ber zinar
Rojê xwe dabû wî milî

Tev bişkivîn çîmen û dar
Payîz ji ber çûbû gilî
Berfa seqem dîl û hejar
Çavkaniyan da ber hilî
Rojê ji ber ew ma neçar
Heyv û sitêr tev herbilî
Hatin li ber pesnê hezar
Xemlê ji wê ax û xwelî
Bê nirx ji ber barê te yar
Gencîniya zêrê kelî
Sûnda bi Homan û bi ar
Yara bi can vîna dilî.

Delala Min

Delala min xezala min

Gulî sîha sipî zendê

Enî rojê birû heyvê

Te çavreşê şeker xwendê

Tilî nazik, te lêv sorê

Ji rengê xunçeya xwînê

Bejin şitla li baxê dil

Bihin wek misk û mawerdê

Di dil min da nebî hesret

Bi ah û ox, ji min dûrî

Çiqa îro dinêrim ez

Xuya nakî gulabendê

Şev û rojan ne dîdarî

Şivanê wan sitêran ez

Bi wê bejna zirav carek

Hila wer can, ji pişt perdê

Li ser sîng û berê nazik

Bixwînim ez, ji ezber tê

Ku porê reş bidim alî

Diyar yarî, ji rû findê

Binoşîn im, ji nav lêvan
Şeraba mey, çiqas xweş tê
Tilî û dest dilîzin ew
Bi dam û kişik û nerdê
Di cenga vê evînê da
Memik park im, ji nêv danê
Siwarê şev keleş kar im
Li meydanê, li govendê.

Gulistan

Bi xêr hatî, li ser çavan delala min perînazî
Bi gorî bin serî û can, ceger û dil bi dilnazî
Bi hêvî ko nekî pirsê cegerdax û evîndar im
Eger pirsî, ji vîna dil, ji nêçîrê birîndar im
Birîndarê evîna dil, ji canan her tu canê min
Ketim davê, hejar û dîl, tu yî akam tu janê min
Gelo dilber tu nabînî di fitrakê giriftar im
Dizanim ku sitemkarî di vînê da nigihdar im
Şev û rojan dinalim her dilê'm dax û keser tê da
Nepirsî qet li rewşa min felek wê tîr li cergê da
Şikestî bask û per û çeng nehat xewnê ne ser dayê
Bi pêlan dame ber sazê ji awazan sowet nayê
Meger pîrê xemê zar im dinoşim mey ji şewşen tê
Ji wê xewnê şiyar bûm ez, li min cîhan bi gulşen tê
Vexwendim yar meya jînê bi mihra wê dilovanê
Bi nazdarî, kubar yarê şîrîn navê Gulistanê

Xetîra roj belavbûyî li çargoşê li dunyayê
Cefakêşî nema rû da, di jîna min şefeq dayê
Enîrojê, birûheyvê, fenerdêmê bi narîn î
Sitî Zîna li ser keşwer, sera û xan, kela jîn î
Sitûna mal, bi comerdî binefş û çiçeka bendê
Temîzkarê, bilindsinçê, şekerpeyvê te pir rindê
Te nadim qet bi zêr û zîv bi yaqût û bi mircanî
li Kurdistan bi xemla bûk serî taca Şeref-Xanî.

Mest û Serxoş im

Mest û serxoş im ji dîna esmerê
Sergiran im ji axîna keserê
Birîndar im ji awirên dilberê
Dilbixwîn im ez ji derba xencerê

Ji berbanga şew şevîna şêrînê
Cegerdax im ji daxa wê birînê
Giriftar im di fitraka wê Zînê
Rengê Memê dîlê benda evînê

Evîndar im ji evîna dêmdurê
Meyperest im şêt û şeyda vê surê
Dîn û har im ji peyala xemxurê
Sade noşîn ew ji destê meyfurê

Xemxur im ez ji çûna bê vegeê
Gelo rast e, weya xewn e, şevberê
Şeva şêrîn bi maça sîng û berê
Dengê dawîn ji dilê min bê derê.

Noşe Noşîn

Noşe noşîn cama ji dest muxbeçînê meyfiroş
Şahî linik te dilber bî meyxurînê mey menoş
Her bi navê nazenîn vexw nebî sawîr ber te goş
Sergiranî wê tê nebîn dev û lêvan mey binoş
Mihra dilber xweşî li can her daye min peyal e
Peyva noşîn guhmest kirî serxweş im zarî lal e
Bejna yarê can û rewan sînga sipî zelal e
Yara bedew mehîtab bû tavê dayî hilal e
Vê şepalê kuştekarê kirim kalê meyperest
Bade noşî ji dest çûme bêhêz ji xwe mame mest
Îro ji dil nalîn û kul fîxan û ahîn ji dest
Her dilkedî bê mihderî mihra wê de dîl û best.

Sorgul

Dilo rabe çî mizgînî!

Mi bihîst ma tu nebînî?!

Ne sawêr e, ma tu dînî?!

Gula li baxa sorgul e,

Gulê tenê rengê xwînê

Ji nav gulan xwînşêrînê

Bi nazdarî bi evînê

Gula li baxa sorgul e

Şebnem li rû wek çîra ye

Şewqa hilat çîr-çîra ye

Çîrîska zêr û dira ye

Gula li baxa sorgul e

Li hev hatî keça bava

Li her dem û hemû gava

Giriftarê tor û dava

Gula li baxa sorgul e

Ketim tora vê dilberê

Dilo bêje te go erê?!

Evîndar im vîna berê

Gula li baxa sorgul e

Hêviya Min

Hêviya xewn û xeyala

Asoya her bîr û bala

Sawêra çavê metala

Hêviya min Hêviya min

Hêviya dil serber nekir

Çavan dît, dil bawer nekir

Dev û lêvan maç her nekir

Hêviya min Hêviya min

Berê xunçan hinguvîn e

Lêvên yaran tim şêrîn e

Ava zelal bi kanî ne

Hêviya min Hêviya min

Ava zelal ji jor barî
Girtî xunav sînga yarî
Du sêvên zer reng buharî
Hêviya min Hêviya min

Buhar xweş e gul li dara
Li ber sîkê digel yara
Dest di paxêl maç bi bara
Hêviya min Hêviya min

Ez û yarê tenê l` manê
Şerbeta ava jiyanê
Tên naşike qet di danê
Hêviya min Hêviya min.

Nesrîn

Li baxê Şamê min dî Nesrînê
Çi gulek dilgeş rewşa vê jînê
Bi hilm û bîn e ew xwînşêrînê
Gulê bi dil e li baxê evînê

Ji wî baxê şên çî xweşdeng û saz
Bilbilê şeyda dixwînim awaz
Çi evîndar im her şêt û dilnaz
Ji bo te gulê ez im yê dilxwaz

Li min binêre b,çavê kirînê
Ji te hezdikim qurban, şêrînê
Ji dil dibarin dilopên xwînê
Bi te dermankim êş û birînê

Birîn pir kûr e, derdê bê derman
Keser ji dil tên, rondik ji çavan

Ji ber derdê te hewar û fîxan
Ez im kuştîyê yar û dildaran

Bi soz û peyman tu wî dost û yar
Dilê bi evîn nabe gunehkar
Li min mehderke ez im evîndar
Ji wê buhiştê nemînim bêpar

Ji şerm û fedî dêm tev lerizîn
Bi çavên du reş lêvên qurmizîn
Kenek ji lêvan dêm tev girnijîn
Me ji ber çavan hevûdû dizîn

Di himbêza te du sêvên Şamê
Bi wan dilîzim şeşreng û damê
Bi min pir xweş e şerbet ji camê
Ji wan tîn naşke naghême kamê.

Xoşevî

Min ji te heskir yar, bê ko kes zane be
W'ez ban te dikim lê, ger tu bes zane be
Tewqe kim gerdenê tu'j min cuda nebe
Çi' b kim ji vê jînê tu lê xuya nebe

Pişt xwe te daye min, bê şerm û bê fedî
Carek li me bine serhişk wek te nedî
Tucar nayê ser rê, her roj tu xeyidî
Ma gelo guneye heskirna dil me dî

Kubar û paye ye çima tu nabêjî
Dil bi qêr û hawar, timî şaş û gêj î
Pesnê te ez bidim ne lal û bi gêjî
Ji qumrî û quling, li ser dengê'm bê jî

Yar gênc û şeng e, ew pir ciwan û rind e
Bi çavên reşbelek, ew qomriya gund e
Heyv ji wê ronyê lêv sor poz bilind e
Leşkera Xuda ye, sotim wekî find e

Min dî yarê rabû can bi min ve tîne
Destê xwe yî nazik rûkê'm dipelîne
Pesnê evînê her birîn dikewîne
Bi noşîn Dilawer, hîn kes me nabîne.

Poşmanî

Neda neda neda , yarê dilêm neda

Wê dilê min revand, ez kirim wek geda

Li pey dil ez ketim, bi qêrîn û gazî

Mehder li min nekir, birîn di dil veda

Me got tu hêjayî, dilxweş û şadarî

Di evîna min de, Zîna giriftarî

Bûme Memê hejar, di rêça dildarî

Dil me gorî te kir, can û ceger teba

Gava min te naskir, dilreş û bikîn î

Ev dilê me'y paqij, bi ah û nalîn î

Me rojek xweş nedî, dilo tim birînî

Mirin tu dixwazî, yarê ew jî neda

Xwezî ne ez bama, ne min te bi dîta
Şerm û fehêt nema, poşmanî nedîta
Nema hêvî ji te, gazin jê bidîta
Poşmane Dilawer, b'erzanî dil berda.

Dilo

Yarê buha dî bi min ken

Şa û henek nedî reben

Rojek min xweş nedî rewşen

Sed hewar ji ber vî dilî

Dilo bo te çûne berger

Peyvek şîrîn maçek ji ser

Li ber linga me xwest mehder

Rû biken me dikir gilî

Serî hilda û yarê got

Can û ceger li min disot

Jehra me ji gotina dot

Derbûn ji can derd û kulî

Bese yarê sergiranî

Temin borî bi erzanî

Tu bi êşa min nizanî

Qut bû ji dil deng û bilî.

Şêrîn Zeriyê

Zeriyê zêrîn zeriyê

Rû mah û şêrîn periyê

Biskên zêrîn şeh kiriyê

Nizanim navê te çiyê?

Dev xunc û şeker reşan e

Lêvê du sor erxewan e

Çavên di zer, gul vedan e

Nizanim navê te çiyê?

Bihar xweş tê gulbiharê

Çîçek û sînem diyarê

Bi min xweş ke tu jînwarê

Nizanim navê te çiyê?

Bes zeriye me hev diye

Lê nizanim tu ji ko ye

Tu bajarî yan gundî ye

Nizanim navê te çiyê?

Ji wî kiras û xiftanî

Hûçk û berpišta te danî

Min naskir tu'j Kurdistanî

Bêrivan û koçeriyê

Narîmanê

Narîmanê Narîmanê

Dil bi kulê dil kovanê

Jiyan xweş e bi dil danê

Narîmanê Narîmanê

Neke gazin ne lorîn e

Neke fîxan dil birîn e

Te dil girtî guneh nîne

Narîmanê Narîmanê

Guneh barke l`gunehkara

Guneh nîne l` evîndara

Evîn xweş e li ba yara

Narîmanê Narîmanê

Dil girtiya nû gihayê

Evîna te are dayê

Birîndarim dil vedayê

Narîmanê Narîmanê

Giriftarê vîna te me

Dilbijokê dîna te me

Ez dildarê jîna te me

Narîmanê Narîmanê

Te Digot Na!!.

Bû xumîna dîlanê

Lê mi d`go`m hernê te`d go na

Ket ber fedyê û qapanê

Lê mi d`go`m hernê te`d go na

Bû gumîna kurmancî

Lê mi d`go`m hernê te`d go na

Ez û te mane li cî

Lê mi d`go`m hernê te`d go na

Li govendê hawar e

Lê mi d`go`m hernê te`d go na

Dest û piya hev xwar e

Lê mi d`go`m hernê te`d go na

Bû hûrzî û şêxanî

Lê mi d`go`m hernê te`d go na

Xwezî b` dilê xortanî

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
Nêçîrvanê kewa ne

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
Serê memka ha wa ne

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
Mîna kewê di dav e

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
paxêl girtî xunav e

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
Kesê ma j` vê dîlanê

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
Dil bi kul û yemanê

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
Xort û keça halan e

Lê mi d`go`m hernê te`d go na
Xwezyam bi dilê wan e

Lê mi d`go`m hernê te`d go na.

Gulbuhar

Gulbuhar gula buharê

Tu xeml û rewşa adarê

Her sal wek îro li darê

Gulbuhar rewşa adarê

Çîçek û gul û nesrîn e

Nêrgiz û lal û gulçîn e

Sînem û kal soninê ne

Gulbuhar rewşa adarê

Sorgul û rîhan, bi bîn in

Binefş û çîmen şêrîn in

Ew bi yara xemrevîn in

Gulbuhar rewşa adarê

Xemrevîna dildaran tu

Serwera evîndaran tu

Dilkuştîyê ciwanan tu

Gulbuhar rewşa adarê.

Dilo Can

Sibe Newroz e dilo can

Li te pîroz e dilo can

Şine şîrav e dilo can

Li te şîn av e dilo can

Gul e nesrîn e dilo can

Bi te şîrîn e dilo can

Neye awaz e dilo can

Ji te şêwaz e dilo can

Sibe sersal e dilo can

Bi te xweş mal e dilo can

Şil e baran e dilo can

Li te halan e dilo can

Dil e dildan e dilo can

Li te mêvan e dilo can.

Xecxecokê

Xecxecokê xecxecokê

Xweştir ji bîna bîhokê

Rû gewez ji pencê rokê

Tu jîndarî gelo bo kê?!

Xecxecoka evîndara

Pêşkêşa destê dildara

Sebra li ber dilê yara

Xecxecokê xecxecokê

Diyar bûyî bi nazdarî

Bi rengê sor hewesdarî

Kê te çêkir bi nîgarî

Xecxecokê xecxecokê

Birîndar im birîn kûr e

Dikim hawar gazî dûr e

Ji ber te dil arê gûr e

Xecxecokê xecxecokê.

Kurtejbînenîgariya Min:

*Ew bixwe ji xelkê Kurdistana Bakur e, ji (Qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik), û ji êl û eşîra Dumila ye.

*Di dema şerê Dewleta Osmanî û Qeyser de û ji ber sedemên ranyarî yên wê demê kalkê wî (Mihemedê ‘Emê) tevî malbata xwe ji gundê xwe derdikevin û berî didin binya xetê. Bi rê de, û li gundekî ji gundên Wêranşehrê Mihemedê ‘Emê dimre. Lawên wî (Isma’îlê Mihemedê ‘Emê û birayê xwe Mihemed) meşextî binya xetê dibin û li bajarê Amûdê bicî dibin.

*Dilawerê Zengî, piştî şewata Sînema Amûdê bi heşt mehan tê ser rûyê dinê. Di sala 1961-ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinê.

*Ji ber rewşa xizanî û feqîrtiyê xwendina xwe ya bilind kuta nekir. Lê xwe ji xwendina pertûkan û çûn û hatina linik mirovên rewşenbîr, siyasetmedar û zanayên Kurd û civatên wan bêpar nekir .

*Di sala 1979-an de, li Amûdê bavê wî diçe ser dilovaniya Xwedê, di wê salê de dest bi nivîsandina helbestanê dike.

*Li ber destê diyeke welatparêz û miletperwer mezin dibe. Evê diyê (Ferîde Elî) akameke (bandûreke) pir mezin li jiyana wî ya nivîskarî û ramyariyê dike. Diya wî Ferîde Elî gelek zarok ji nav agirê sînema Amûdê xelas kiriye û bi navê diya Pakrewanan tê naskirin.

*Bandûra Şêxê welatparêz û miletperwer (Şêx Sedredînê bavê kal) pir lê dibe û li ser destê wî dest bi nivîsandina Kurdî dike.

*Du salan li gundê (Girê Sor) mamosteyî dike.

*Di sala 1979-an de, li ber destê seydayê Tîrêj hînî nivîsandina helbestê dibe, û ji wê rojê de heta roja koçkirina seyda hevaltiya wan berdewam kiriye. Hêjayî gotinê ye ku seydayê Tîrêj navê Dilawer lê kirye.

*Di sala 1980-an de ji neçarî berê xwe dide bajarê Şamê û li Zangoya Şamê kar dike. Piştî heşt salan ew dûrî karê xwe dikeve. Ji wê rojê de, xwe ji nivîsandin û lêkolîn û xebatê re vala dike.

*Di sala 1983-an de li ber destê Osman Sebrî hînî nivîsandina serbest dibe. Ji wê rojê de, li dora deh

salan, têkilî di navbera wan de berdewan dibe ta ku Apê Osman ji nav me koç dike.

*Li bajarê Şamê gelek qursên fêkirina zimanê kurdî li nav kurdên Şamê lidar dixê û bi sedan xort û keçên kurd fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dike.

*Di warê ramiyariyê û siyasetê de, li dora 35 salan kar kiriye û di vî warê de gelek keda wê heye.

*Di sala 1987-an de Rewşen Bedir-Xan nas dike.

*Piştgiriya Rewşen Bedir-Xan di wergerandin, amadekirin û weşandina çend pirtûkên wê û yê malbata wê de kir. (Bîranînên Salih Bedir-Xan. Name bo Mustafa Kemal paşa. Mîr Bedir-Xan. Ê....hwd).

*Di sala 1991-ê de piştî serîhildana Kurdên başûr, diçe Kurdistanê û li wir çend semînerên rewşenbîrî û toreyî girêdide.

*Di hin rêdaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dike.

*Ji bilî nivîsandina lêkolîn û helbestan karê rojnamevaniyê jî dike. Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de nivîsandiye û dinivîsîne.

*Gelek dîwanên helbestvanên Kurdan yê navdar ji tîpên Erebî wergerandiye Latîni û pêşgotin ji wan re nivîsiye ji wan: (Seydayê Tîrêj: dîwanên wî: Xelat, Zozan û Cûdî), (Seydayê Bêbuhar: dîwana wî: Zindan)...û du dîwanên helbestvan Ebdurehmanê Mizûrî (Ji evîna çirayên kevin û li xelkê tehlê li min şêrînê). Li dora (200) pertûkên li ser tore, çande, dîrok, û folklorê Kurdî li Sûriyê daye weşandin.

*Di sala 1985-an de jin anîye. Sê kur û keçek wî hene: (Royar, Rodî, Ronî û Rewan).

*Di sala 1999-an de ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di 12/7/2000-an de, li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe bajara Enqerê û xelatê pêşkêşî prof. İsmâil Beşikçi dike.

*Di sala 2004-an li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide xanima hêja Danyêl Metran.

*Di sala 2008-an de, li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide mamosteyê gewre Munzir Elfedil.

*Di sala 2011-an de careke din ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di sala 2012-an de, ji hêla komela Celadet Bedir-Xan ya çandeyî li bajarê Qamişlo hat xelat kirin.

*Di sala 2013-an de, ji hêla komela Şawîşka li bajarê Qamişlo hat xelat kirin.

* Gelek caran serdana başûrê kurdistanê kiriye û ji aliyê serokê kurdistanê Mesûd Barzan û Celal Telebanî û gelek serkirdayetiyên partî û rêxistinên siyasî û rewşenbîrî li başûrê kurdistanê dihate pêşwazî kirin.

*Têkilî, danûstendin û hevaltiya wî bi van navdaran re pir xurt bû: Seydayê Tîrêj, Seydayê Cegerxwîn, helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), ronakbîrê mezin Osman Sebrî, wêjevana gewre Rewşen Bedirxan, dîrokzan Hesên Hişyarê Serdî, helbestvan Keleş, helbestvan Hamid Bedirxan, helbestvan Umerê Lelê, Zimanzan Ehmedê Palo,

helbestvan Hadî Behlewî, zimanzan Rezoyê Osê,
helbestvan Mihemed Elî Heso, helbestvanê hêja
Ehmedê Şêx Salih.. û htd.

* Berhemên wî di warê Helbest, Çîrok, Ziman,
Dîrok, Wêje, Folklor û wergerandinê de, li dora (40)
pirtûkî weşandiye. Gelek pirtûkên wî destnivîs hene..

*Ji sala 2013-2020an de, serokê Yekîtiya
Nivîskarên Kurd-Sûriyayê bû.

*Xelata Azadiyê ya Şehîd Miş'el Temo ya salên
2017-2018-an, li bajarê Qamişlo wergirt.

Berhemên min:

***Mem û Zîn, Ehmedê Xanî**, Veguhestina tîpan ji
Erebî bo Kurdî; Dilawerê Zengî û Seydayê Tîrêj.
Şam, 1984 (Destnivîs)e.

*Dîwana (**Pêdarî**), Helbest. Sal:1985.Şam.

***Gramêra Ziman**-Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko
-wergerandin-1990. Şam.

***Ji Mesela Kurdistanê**- Celadet Bedirxan-
wergerandin-1990. Şam.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (**Ji Evîna Çirayên Kevin**) veguhestina tîpan 1991.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (**Li Xelkî Tehlê li Min Şîrînê**)- 1991. Şam.

***Mîr Bedirxan:** Lutfî, wergerandina: E.S. Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ. Şam.

*Alîkariya Rewşen Bedir-Xan kir di weşandina hin pertûkan de, ji wan:

-**Bîranînên min** -Salih Bedirxan-. -Name bo Mistefa kemal Paşa. (Celadet Bedir-Xan). -Bîranînên jinekê (perçê dudiwan).

***Şerefnameya Menzûm**- Cegerxwîn- ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, û lêveger, ravekirin û serastkirin.1997.

***Ez û Agir**- Dîwana helbestvan Hizrewan-wergerandina tîpan 1998.

***Stran, berf û baran** -helbestvan Mûeyid Teyib wergerandina tîpan.

***Bedirxanî di Cizîra Botan de-Malmîsanij-**
wergerandin: Gulbuhar Bedir-Xan û D.ZENGÎ.
1998.

***Berî Heyv Hilê** -çîrok- wergerandina Tewfîq El-
Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebî. Ji weşanên
Mîdiya-Erbîl. 2001.

***Qedrî Can-Helbest, Gotar, Çîrok û**
Wergerandin.- amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê
(Erebî). Çapxana Aras, Hewlêr 2001.

***Bîranînên Osman Sebrî-** bi zimanê Erebî-
2001. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*** Bîranînên Osman Sebrî-** bi zimanê Kurdî -2005.
Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

***Şerrên Sasûnê** -Osman Sebrî-.komkirin û
amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan.
çapxana Emîral. Careke din li Istanbul, weşanxaneyê
Pêrî, 2005- hate çapkirin.

***Dîroka Kelepûra Mîrnişîniya Botan.** –Mele
Xelefê Bafî.-veguhestina tîpan. Bi zimanê Kurdî -
2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

***Qedrî Can -Helbest, Gotar, Çîrok û Wergerandin.**- amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana komal, Istenbol-2004. Careke din ev pertûk li çapxana Emîral, Beyrût- Libnan. 2005-an de hate çapkirin

***(Wesenun Lil'îşiq)** dîwanek ji helbestan-wergerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî bo zimanê erebî. Weşandina Dar -Kîwan-Şam -2005.

***Dîwana Helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), Zindan,** veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.

***Dîwanên seydayê Tîrêj (Xelat-1, Zozan-2 û Cûdî-3),** veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.

***Mewlûda Pêxember** –Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral. 2006.

***Serpêhatiyên Kurdan-Tîrêj-** veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût- Libnan. Çapxana Emîral.2009. Di sala 2010-an de, ev pirtûk hatiye wergerandin bo zimanê Erebi, digel nivîskar Tewfîq Huseynî -Şam.

***Muxtarat** (Lîqaat we Hîwarat), D. Zengî, Perçê 1-2. Beyrût-Libnan.Çapxana Emîral. 2009.

***Etyaf El-Madî**, Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.2009.

***Bînahî-** (Gotar û Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), D.Zengî, Beyrût – Libnan. Çapxaneya Emîral.2010.

***Ebdulrezaq Bedir-Xan**, wergerandina D.Zengî, Beyrût - Libnan 2010

***Bîranînên Celadet Bedir-Xan**. Komkirin û veguhestin: D.Zengî. Bi herdû zimanan /Kurdî-Erebî/. Çapxana: Emîral. Beyrût-Libnan. Çapa: didiwan. 2010.

***Çîrokên Kurdî**, Danheva: Rojê Lîsko, Wergerandin ji zimanê Kurdî: Tewfîq Huseynî û Dilawerê Zengî, Şam, 2010.

***Ji wêjeya dozê**. Amadekirin û komkirina D.Zengî û Ehmed Şîhab. Elmanya- Berlîn- 2011.

***Osman Sebrî**. (Jiyan, Tekoşîn û Berhem), Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana: Emîral.Sal: 2012. Bi zimanê Kurdî-Erebî.

***Çîroka Alaya Kurdî.** Qamişlo. 2012.

***Pirtûka (Wêjeya Kurdî- Di navbera Rastî û hêviyan de)**- Daner: D.Zengî Qamişlo, 2014-an.

***Tedarîs El-Edeb El-Kurdî,** Wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebî, Qamişlo, 2014.

***Pirtûka (Kurd û Kurdistan)** Daner: D.Zengî. Bi zimanê erebî, Qamişlo, 2015-an.

***Nivêjên Êzîdiyan-** Celadet Bedirxan-Veguhestina tîpan ji erebî bo latînî: D.Zengî-Qamişlo, 2017

***Xwendina Kurdî,** Kamîran Bedirxan. Wergerandin bo zimanê erebî: D.Zengî. Qamişlo 2017

***Rewşen Bedir-Xan,** (Jiyan û Berhem). Dilawerê Zengî, Qamişlo 2017

***Ji Xunava Bîranînan,** (Dîtin û Hevpeyivîn), Qamişlo 2017

***Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de,** Daner: Husên Hebeş, Wergerandin ji zimanê Kurdmancî bo zimanê Erebî: Dilawerê Zengî, weşanxana: Dar, Qamişlo, sal:2017.

***Rewan**, (Gotar û Lêkolîn), Pêşgotina Dilovanê Deştê Qamişlo 2017

***Tabloyên Şerefnamê**, Ebdulreqîb Yûsiv Zıvıngî, wergerandin ji zimanê kurdmançî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2018.

***Destpêka edebiyeta kurdî**, Mihemed Uzun, wergerandin ji zimanê kurdmançî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2019.

***Şerên Sasûnê**, Osman Sebrî, wergerandin ji zimanê kurdmançî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2019.

***Qîrîna Mirinê**, Dilawerê Zengî, bi zimanê Kurdî-Kurdmançî, Pêşgotina Dilovanê Deştê. Çapxana pêla, Qamişlo 2019

***Gulistan**, dîwanek ji helbestan, bi zimanê Kurdî-kurdmançî, çapxana pêla, Qamişlo 2019

***Kurdên Çewisandî û birayên wan ên Misilman**, Cemal Nebez, Wergerandin ji zimanê Erebe ji bo zimanê Kurdî: Dilawerê Zengî, Qamişlo, 2021, çapxana Pêla.

Pêrist

Diyarî	5
Pêşgotin	7
Min Şop Ajot	15
Kurmê Darê ji Darê ye	20
Pêdarî	25
Li Qamişlo.....	27
Bêjin Erê	33
Şîna xebatkar Hemîd Hac Derwêş.....	34
Ez Evîndarê Welat im	36
Ferînaz Bûka Kurdistanê	37
Kobana Berxwedêr	39
Efrîn	41
Gazinê ji Kê Bikim	42
Ne Dîn im Ez Dîdar im	46
Sirûda Abeya Kurdî	48
Gelawêja Biçûkan	50
<i>Gulistan</i>	105

Ey Mirin.....	51
Bavê Şiyar.....	54
Ji Rewan re.....	56
Hêvîn	59
Palûte.....	61
Bese e Yarê.....	62
Yarê	63
Delala min	65
Gulistan	67
Mest û Serxoş im	69
Noşe Noşîn	71
Sorgul	72
Hêviya Min	74
Nesrîn	76
Xoşevî	78
Poşmanî	80
Dilo	82
<i>Gulistan</i>	106

Şêrîn Zeriye	83
Narîmanê	85
Te Digot Na!.....	87
Gulbuhar	89
Dilo Can	90
Xecxecokê.....	91
Kurtejînenîgariya min	93
Pêrist	105

